Şêrko Bêkes

# Daḻ

*helbest*

Weşanên
Apec -tryck & Förlag

هەواڵنامەی کتێب
&
KURD ARSHIV

# DAL*

ÇÊRUKE ŞÎ`R

ŞÊRKO BÊKES


Wergerandin ji tîpên erebî
Xalid Xalid

---

* Qertel,laşxor

Utgivare: Apec-Tryck & förlag
© Şerko Bêkes
Stockholm 1989
ISBN: 91 87730 03-0

ADRESS
Box 3318, 163 03 Spånga
Sweden



## ÇEND PEYVÊN PÊDIVÎ

Li ser daxwaza havalên Kurd, yên ku bi tîpên latînî dixwînin, me ev "Çêroke Şî`re"ya helbestvanê Kurd Şêrko Bêkes, ku bi kurmanciya xwarê û bi tîpên erebî hatîye nivîsandin, wergerande ser tîpên latînî. Mebesta me ji vê çendê ew e, ku heval bikaribin vî berhemî bixwînin û sûdê jê werbigirin. Dîsan me bi pêwîst zanî peyvên giran şirovekîn. Hîvîya me ew e, ku xizmetekê pêşkêşî xwendevanên hêja bikîn.

Spas ji bo wan hevalên ku destê harîkariyê ji vê pirtûkê ra dirêj kirin.

Uppsala 1989

Xalid Xalid

## ŞÊRKO BÊKES KÎ YE

Şêrko Bêkes,lawê Fayîk Bêkes e. Şêrko di sal 1940 î de li bajarê Silêmanîyê ji dayik bûye. Li wir lîseyê tewa kirîye. Bavê wî bi xwe helbestvanekî mezin e. Ew di warê edebî û perwerdekirina Şêrko de rolekê mezin û girîng lîstîye.

Şêrko Bêkes ji 17 saliya xwe ve dest bi nivîsandina helbestan kirîye. Ta niha gelek berhemên hêja û giranbiha afirandîye. Pirtûkên wî yên ku hatine çapkirinê ev in:

1. Tirîfey helbest, şî`r, 1968
2. Kejawey giryan, şî`r
3. Kawey asinger - şanunamey şî`, 1971
4. Min tînuyetîm be gir eşkê, şî`r, 1973
5. Asik - şanunamey şî`r, 1978
6. Kazîwe, şî`r, 1978
7. Dû sirûdî şêwî, şî`rî dirêj, 1980
8. Pîremêrd û zerya,wergîrawe le zimenî erebîyewe, romanî Hamingway, 1982
9. Rûbar, çîroke şî`r, 1984
10. Helo, şî`r be rangarbûnewe, 1985
11. Awêne biçkolekan, şî`r, 1986

Şêrko, bi awayek nûjen (modern) helbestên xwe dinivîse.

Penklubba Swêdê, di sala 1987-an de Şêrko Bêkes hêjayê xelata TUCHOLSKY dît. Şêrko, di sala 1987-an di 14 ê meha tebaxê de li Swêdê xelata TUCHOLSKY wergirt. Serokwezîrê Swêdê Ingvar Carlsson bi xwe xelatê pêşkêşî Şêrko Bêkes kir. Bi xelatgirtina navnetewî, Şêrko Bêkes serê helbest û wêjeya (edebîyata) kurdî gelek bilnd kir. Û nav û dengê wêjaya kurdî gehêştan her aliyê cîhanê. Herweha helbest û wêjeya Kurdî kete pêvajokê nû û bilind.

Şerko, niha jî li Swêdê ye û wekî penaberekî Kurd yê polîtîk li Swêdê dijî.

Weşanxane û çapxana,me, weha bawer û hêvîdar e, ku bi wergêr û çapkirina Dal bi tîpên latînî, dê karek hêja û berjewendiyek çak bigehêne xwendevanên Kurd. Û ji aliyek din ve jî ew dîwarê ku di nav herdu alfabeyên kurdî de hene, heger neye rakirin.jî, kevirek jê dikeve. Dîwar qul dibe. Me, helbestên Şêrko ji kurmanciya jêrîn nekir kurmanciya jorîn; ji ber ku me nexwest orjînala wan xira an wenda bibe.

APEC TRYCK & FÖRLAG

"Aşûr Hemdan" le wilatî lim ucacewe (1) hat û
Îste danîştûy wilatî guêz û befre
Ber le îste
-Serîfeyek- ke wek danî kilor wabû
Hesîr rizîw, wek teley mişk
Tengeber û dirêjkole
Malî ew bû, mal rûtele
Desal pêştir..
Aşûr polîsî badiyey (2) rojawa bû
Wek deştî kakî be kakî (3)
Tep û toz umrî (4) qut dabû
Desal pêştir..
Teley "Efleq" le wê le naw
Qulley mexferêk da girtî

*

---

(1):Hîr û reşeba
(2):Peyveka erebî ye, bi mana deşt
(3):Çol û beyar
(4):Peyvekî erebî ye, bi mana jî,temen

Aşûr bû be pêçkey muselehey (5) rejêm
Be ber çawî Furatewe..
Gelê qetî (6) xoşewîstî biyabanî
Le jêr xoyda pan kirdewe..
Bo Bexday tor
Bû be bazî destemoy "şêx" î rijîm û
Gelê balindey helatûy (7) jêr zemînî (8)
Le ser sinûr egirtewe..
Roj le diway roj
Îtir Aşûr bû be deskêş
Bû be kîfî diroy dû dem
Bû be kêrd û xelkîş nêçîr,
Bû be "nesîr" (9)
Bû be "agul"
Bû be çawî tewrî emin
Bû be "refîq" (10)
Bû be giwêçkey dar û dîwar û bû be mar.

*

Le meqerî dalaşêkî (11) nêw şarewe
Hawînêkyan demew esrê
Dinya mencele qîrê bû
Ekula û yeqî edayewe.

---

(5) Otomobîla polîsî
(6) Navê teyrekê ye.
(7)Miştex, dûr welat
(8) Bin erd, veşartî
(9) Pîleyeka partiya BEES e.
(10) Pîleyeka partiya BEES e bi mana heval.
(11) Qertelê mezin

Zor be pele hewalêkî pê xawsî xohelkirdû
Wek reşeba
Le ber malekey Aşûr da
Limî lûl daw
Witî: Refîq toyan ewê

*

Hole dalî poştey (12) naw şar
Be çend taqimê mubêley, rengînî nerm û nolewe
Bê le Aşûr, pênc-şeş dalaşî qelewî
Le dewrî mêzî şûşebend kokirdewa..
Gewre dalaşî biyaban ser keçele
Yekem dal bû hate qise:
-Refîq Aşûr!
Peyamîême û şimşêrî bapîranman her yek şit e
Her yek alaw her yek mişt e
Miştî nemir! Peyam (13) helgir
Hewa le Kwê bê le wê ye
Deşt le Kwê bê ew le wê ye
Şax le Kwê bê ew le wê ye
Em cîhane hewîrê bû ereb şêlay
Kirdî be nan..
Xor Kwêr ebû egerême nebûyna ye
Aw ekujra egerême nebûyna ye

---

(12) Miroveki rêk û pêk
(13) Soz

Refîq Aşûr!
Espî peyam nizîk û dûr
Bo her layek ême berê
Ême suwarîn!! refîq Aşûr.
Le rojawa û rojhelatî
Em xerîtey şimşêreda
Le gwêçkey behrî sûrewe
Heta qurgî şaxî piştko
Gule genmê le kwê riwa
Rikaetê le kwê kira
Kilo befrê le kwê barî
Sawayek le kwê nawnira
Lem xerîtey şimşêreda
Her be tenha ereb heye û
Kesî tir na!
Refîq Aşûr!
Şîmal.. ser e.
Demê sale lem sereda
Rişk geray xoy xistuwe
Pîlanê pepkey xuwarduwe
Kurî şimşêr
Kurî quran.. ebê birwa
Biçêtewe ser berde nwêjî bapîran
Biçêtewe lay giyanî "Eba Ubeyde"
Birwatewe û ser le rişk pakatewe
Birwatewe û le wê bijî.
Refîq Aşûr!

Le şîmalî xoşewîst da

Bûkî spî şaroçkeyek (14) çawerête
Lemro be duwawe baweşî ew bûke man
Şwên û Cêt e
Hizb şimşêre (15) û tu destî
Ba bizanîn ew şimşêre
Le çend lawe eweşênî
Refîq Aşûr!
Eme dengî fermanêke şimşêr asa
Ke le kîf (16) hate derewe
Naçêtewe naw kîf heta
Xoy sûr ne ka!
Lew sate da (17)
Aşûr butlêkî xalî bû
Kewtibuwe naw gêjawewe
Le mabênî sard û germa
Berz û nizma
Ser û binda
Ehat.. eçû
Helçûn bo berew jûr eybird
Daçûn wekû berbûnewe
Xeyalî kert (18) û pert ekird
Ewyan be peyjey (19) Tikrîta bo naw
koşkî bilûrînî
Pile û paye serî exist
Emyan samî şax û dax bû

---

(14) Bajarekî biçûk
(15) Sur
(16)Kavlanê xencer û şûr
(17)Demekî gelek kurt
(18) Parçe parçe
(19) Pêstirk, peyîsk

Le naw derûnêkî sar da
Xilbûnewey taşe berdî
Rewew nax bû.
Aşûr diway ewey ke qurgî
Le belxî tirs pak kirdewe
Înca witî:
-Le berdemî em fermanî şimşêre da
Goçanîn (20) û kemey milman
Tewaw keç e
Le berdemî em fermanî şimşêre da
Kê etwanê kirnûş ne ba
Belê! erom
Her hefteyek moletim ben
Ta egeme ew bûkey xom.
Dalêkî tirî çaw zerdyan
Le gel qaqayekî (21) berza helîdaye
-Refîq Aşûr!
Elên jinî ew şaxane gerçî befrin
Belam befrî germ û nerm in
Refîq Aşûr!
Wa tu eçî
Şîmal sê şitî şîrîn e
Hengwîn û gwêz û afretî!!
Qaqay berzî dirêj xayen
Pilîkaney deng danewey yek le ser yekî naw hol bû
Dal be keyf û dewr û berîş

---

(20) Gopal
(21) Pêkenînek bi dengê bilind.

Wek derûnî ew wilate
Kiş û mat û çol û hol bû.
Katî hestan
Dale gewrey ser keçele
Çekmecey mêzî rakêşa û
Fayilêkî lê derhêna
Be xetêkî diriştî sûr
Lêy nûsrabû!
karî tazey "Aşûr Hemdan."

*

Mangêk ebû Aşûrî mêşe segane
Geyiştibuwe naw şroçkey çaw be giryan
Mangêk ebû geney be`sî
Be lamilî ew kewewe niştibowe
Katê yekem namey nûsî:
Hawrêyan!
Maç û selam
Min êstake
Le baweşî beheştêkî biçkoledam
Belam ewey wekû qewze
Wekû xilte..
Em mawe ye dilî girtûm
Taşe berdî..
Em zimane req û teq û negrîse ye (22)
Zimanêke cîwey wişey
Le naw gerû da bend nabê û

(22) Giran û nexuş û xirab

Ristey xêray elêy leşî marmêlke ye.
Mesudî başî bo çuwe
Eme qisey miro ye yan
Cûke Cûkî (23) beçke dêw û cinoke ye (24)
Hawrêyan!
Pêwîst e bem nexşeyeda biçînewe
Wekû serî gundî yaxî
Be şimşêrî zimanî Xwa...
Em zimaneş bibirînewe!
hawrêyan!
Dwênê didanî zor nawî
Leq û klorî naw demî
Em nawçeyeman helkêşa
Le şwên ewan..
Taqimî nwêman bo kirdin.
Wekû mindalî tazebû
Dîsanewe naw man lê nan:
Gerekêk man da be "Se`d" (25)
Yekêkî tir be "Quteybe" (26)
Meydanêk man kirde berî hewtî nîsan
Rast e şeqamî şaroçke
Şimşêrêkî dest sewz bû
Damane des kurî "Şîban"
Bo sware gewrekey Yermûk
Baxçeyekman bo kird be bûk.
Hawrêyan!

---

(23) Dengê teyrên biçûk
(24). Cin
(25) Navekî erebî ye.
(26) Navekî erebî ye.

Her dwênêş bû laney çetey
Bîst gundî tir..
Bûn be xorakî nîweroy
Sikî agir..
Le şaxewe le derbendî asîyewe
Bo berew xwar damangirtin
Ajel (27) bûn û ..
Mîwey genîwî rez bûn û..
Çendîn zîlman lê pir kirdin
Hawrêyan
Îste şewe le ber pencerey jûrewe
Rawesta wim
Serinc edem lem dinya ye
Agirî êmeş le dûrewe
Esûtêt û ecrîwênê (28) û
Elêy milwankey (29) fisforî
Gerdin û singî çiya ye.

*

Ke Aşûr hat
Le huştirêkî ler (30) eçû
Milî dirêj
Laqî barîk
Çawekanî be qulaçû (31)

---

(27) Lawir, dewar
(28) Diçîrose
(29) Stivank, gerdan
(30) Lawaz
(31) Cav tebiqî

Ke Aşûr hat barî sûkî
Ser dûgî (32) xist
Ta çend rojê malî nebû
Le meqerî dalaş enûst
Diway hefteyek birdiyane ser
Malêkî derga daxiraw
malêkî derga mor kiraw
Malî - Azad
Kurî kêwî derdest (33) ne kiraw..
Wextê dergay malyan şikan
Aşûr bo xoy rawestabû
Be çuwar dewra wek elqeyek (34)
Rimî çeqîw..
Çek be destî çaw gomî xwên
Dewryan dabû..
Wextê dergay malyan şikan
Aşûr bo xoy çuwe jûrê
Serincî da
Mal hazir e
Mal poşte ye
Wek ew wexte cê hêlrabê
Cige le toz û gerdêkî le rû nîştûy
Reng xemawîy
Ser şit û mek
Hemû şitê le ber desta û amade ye
Hemû şitê.. hemû şitê
Ferş, Petû.Serîn. Doşek

---

(32) Pişta deve, pişta hustir
(33) Kehîkirî
(34) Gustîrk

Kentor. Dolab. Qab û qaçax
Hemû şitê.. hemû şitê
Bûke şûşey bizegirtûy
Çawşînî ser qenefeyek
Eskerêkî reşaş be des
Ser û sîma girj (35) kirdû
Qaçî rastî bo pêşewe.. hêriş birdû..
Bergî berî belek belek..
Aşûr erwa û çaw egêrê
Emcareyan le ber dîwarî jurêkda
Îstêk ekaw raewestê
Wêneyekî cam tê gîraw
Çuwar çêwe şîn
Wêney Azad û jinekey
Aşûr toze xoy hel ebirê
Le astî dem û çawyan da.. be lepî dest
Toz û gerdî ser cam esirê
Azad rûntir derekewê
Jin şerminok
Belam Azad çaw geş çaw geş
Pê ekenê..
Aşûr kemê raemênê (36)
Lew sateda..
Wa hest eka,
Tirsêkî dûr.. tarmayîyek (37) le Azad çû
Rawî enê..
Le pirêk da dest edate wêney dîwar

---

(35) Ser û çavên miroveki rû tirs
(36) Hizir dike
(37) Reşatîyek

Day egrêt û eyşkênê
Lew jûreyan dête derê
Erwa le ser kursî dalan
Daenîşê..
Dem û lûtî ebine borî
Dûkelkêş û..
Cigerey bîstem ekêsê..
Emcareyan dest edate.
Eskereke û
Qurmîşekey baedat û baedat û
Beramber bûkeşûşeke qinc dayenê
Reşaş çiwar pênc rîz ekat û
Bûkeşûşe çaw şîneke ekewêt û
Ewsa Aşûr pê ekenê û
Mal cê dêlê

*

Îste Aşûr huştirêk e qelew wirgin (38)
Berazêk e şifre asin
Îste Aşûr lem melbendey Kurdistanda
Qulapî şadî girtine
Le naw gomî se`atekanî rojgar da
Le naw gomî seàtekanî şewgar da
Masî rohî zerd û sûrî xelk egirê
Îste Aşûr lem melbendey Kurdistanda
Be qed gule jaley zamî leşî (Yafa) (39)
Le naw banqî xwênî min da parey heye

---

(38) Zik mezin
(39) Navê bajarekê ye li Felestînê

Hezar car hîndey beydaxî "Felestîn" û
Fotey serî daykanî male şehîdî
Gerekêkî reşpoşî Quds
Metre zewî û erdî heye
Be qed her şeş
Goşey estêrekey Dawid
Medalya û notey Kurd kuştinî heye.
Îste Aşûr
"Wehde"y (40) demî qîme kêşî ser cestem e
"Hurîye"y çeqoy şofil e û pêşkey mergî bildozer e
Îştirakîyet lay Aşûr.. dabeş kirdinî hejarî û
Brînî cewr û stem e.
Emro Aşûr hawrêy Aşûr hîzbî Aşûr
Şewan direq ke petî sêdare enwê
Le serdabî (41) eşkencema koebinewe..
Çekmecey umrî zîndanîm raekêşin
Teskerey mindal û gewrem derehênin
Gewre giçke ekenewe
Giçke gewre ekenewe
Siyanze bo bîst
Heşta bo çil..
Ta, beyanî ke roj bowe
Be pilîkaney qanûnda
Ser yan xen û
petî mergyan bikene mil.

*

(40) Wehde, hurriye û îştîrakîye. Sê peyvin. Mana wan yekgirtin,azadî û sozyalîzm e ku ev hersê slogana Partiya BEES e.
(41) Joreka jêr erd

Ta çek serî hel nebrîbû
Heta xak ra neperîbû
Ta Qendîl heloy nedîbû
Wişe gulley nanasîbû
Şimşêrekey destî Aşûr wek reşeba
Bê tirs û tenya egera
Şimşêrekey destî Aşûr
Le kam şwên da bîwîstaye (42)
Şeqam buwaye
Eşkewt buwaye
Ronak buwaye
Tarîk buwaye
Daegera (43) û hel ekera
Wîjey ehat..
Hel eşûra.
Aşûr kelegay rojgar bû
Lêre û le wê her siwar ebû
Suwarî ser û siwarî mil û
Suwarî şar û suwarî gund û
Suwarî çiya û rûbar ebû.
Ta ew wextey îtir tifeng
Çawî giloft
Cûla û hesta û kewte ser pê
Çiya milî qut kirdewe
Şeqam destî raweşan û
Qelem wişey kokirdewe..
Ewsa îtir bere bere
Şimşêrekey destî Aşûr

(42) Divîya
(43) Hate xarê

Bû be reqe
Ke şew ehat
Milî ebirdewe diwawe bo naw qawix (44)
Be roj ehatewe derê
Taway lê hat
Şimşêrekey destî Aşûr
Le sêberî kîfekey xoyşî bitirsê.
Şewe şewî çaw çaw nebîn
Tep û nimî baran barîn
Hajey naw dol û kef çirîn (45)
Xurey şetaw (46)
Biwarî çemî zor hestaw..
Şewe şewî çaw çaw nebîn
Mefrezeyek.. yek le diway yek
Be hengawê yan dû hengaw
Serî lût û perey gwêçke
Sir û tezîw..
Mefrezeyek.. her êware berê kewtû
Tiyayandaye şew nekirdû
Yek le diway yek
Be hengawê yan dû hengaw
Be mişemma çek dapoşraw.
Naw be nawê
Şewqî xêray laytî dest
Bo berdem û bo rast û çep
Ke tîşkî tîjî ehawê
Le awêney şewqî tera

---

(44) Kavilê pişta kûsî
(45) Kefa avê
(46) Mişêna avê

Laskî baranî reng zîwîn
Çend rîzêkî derekewê.
Bergî ber ter şilpe (47) yan dê.
Legel duwan (48) û qise da
Piçir piçir (49)
Wekû lûley kitrî kulaw
Dem halawî lê hel esê
Pêlawî lastîk kirj bû
Aw têyeçê û
Şilqe şilq
Serî pencey tiya etezê.
Qurî deştî spî bawî
Le ketîre û le sirêş çû
Wekû binêşt hengaw egirê
Car be carîş tu eroyt û
Le duwatewe.
Takê şêlaw cê emênê.
Şerwal deling qurawî
Des gonaka (50) û
Henasey singî naqim bûş
Çolekeyeke xinkaw û dem dapiçrîw (51)
Ser derdênê..
Le nakawîş leber demta
Hewrazêkî kûrî rûten derekewê
Ay lew wexteda gwêt lê bê..

---

(47) Şepêna avê
(48) Qisekirin, axaftin
(49) Piç piç dipeyvê
(50) Ji serma nikarêt bilivît, tevizî
(51) Li tirsa

Her eşron û leber xowe
Cinêwî çon be zistan û qur û lîte û
Daykî pêlawî lastîk û
Aşûr edirê!
Şew şewî çaw çaw nebîn
Mefrezey keneft egate
Şwênî mebest..
Bilaw.. bilaw.. dû sê kemîn daemezrê
Dengî beriz û layit lêdan
Wekû kêşanî cigere
Le naw yek da
Hereşeyan zor lê ekirê.

*

Şaroçkey gilop helkiraw
Lew berzewe ke ebînrê
Elêy estêrkî pirşing e
Yan mirwarî helrîjaw e
Brîskey dê.
Îste zorî wekû Azad
Ke çenagey (52) xeyalî meng
Exene ser lûley tifeng
Lew dûrewe henase bo
Şar û mal û yadgarî talan kiraw
Hel ekêşin..
Ezanim çon tozêkî tir..
Ebin be gerdawî agir daegerên

---

(52) Erzink

Ezanim çon tozêkî tir..
Le şarî şeqam kujrawa ewestin û
Mîlî tole raekêşin.
Şewe şewî çaw çaw nebîn
Lew sate da şoriş rengî narincî ye
Gulley girdar wa enusê
Lem sate da şoriş tewqey mizgênî ye
Helatinî dal wa elê..
Lem sate da şoriş tarîkî rawnan e
Dîlkirdî şimşêrekey destî Aşûrîş
Wa elê.

*

Serî kolan etwit demî pirêmize û dagîrsawe..
Dewrî fulke (53) kemînêkî kun bir.. mehkem (54)
Wekû piştênî asinîn dewrî dawe..
Xwartir boseyekî çepek
Wek nane çewrey naw tele
Her bo rakêşanî nêçîr danirawe..
Dest rêj. Gîze. Teqînewe. Qirme qirm
Zirme. Hare. Tirpe tirp. Girme girm
Înca samêkî (55) bêdengî
Le pirêk da kujanewey gilop hemû
Tarîkiyek be serda dê
Tarîtir e le tarîkî

---

(53) Çatirê
(54) Mikum
(55) Li tirs

Wekû xoyan teqey şilejawî (56) dujmin
Ser eken û xwar eken û gulley wêl in
Wa le jêllawe.. pîkabê
Lût berz renk zerdî mexawîr (57)
Dû rîzî pişt le yektirî
Eskerî reş reş wekû qîr
Danîştûn û lûley çekyan
Bo rast û çep rû le derê
Pîkab wekû tîşkey tifeng
Dereçêt û rû le serê
Le diwayşewe landroverê
Ne bûn be duwan
Ne bûn be siyan
Gîzeyek (58) û tê eperin.. na sîxnax û têk tiricaw..
Le tîjî da (59) serinc firyayan nakewê
Pîkab dêt û dêt û dêt û
Bosey yekem kir ebêt û
Bosey duwem enqest (60) eniwêt û
Sêhem herçî nale û girmey mefreze ye
Be culanî çend pence ye.
Şalawêk (61) in rû ekene ew cêge ye û
Îtir pîkab
Wekû şeqam be qaçî xoy
Tê heldat û be hewa da (62) firêy dat û

---

(56) Têkçûyî, bê ser û ber
(57) Navê leşkerekî taybetî ye li Îraqê
(58) Dengê otomobîla ku bi lez diçît.
(59) Bi lez
(60) Bi zanebûnî
(61) Xurt
(62) Asman

Dêwî baldarî agirî tê ber bidat
Helegîrsê û
Helegirçê (63) û
Helebezê (64) û
Daebezê û
Lûtî şikaw wergêrê û
Dûkel eyxwast..
Pîkab hêşta be hewa da
Ezirîkênê..
Ke le diwawe ewanî tir
Hewiîî leşî yektiryan
Le naw bodiya şêlawe.
Benzîn û xwîn û grîs û goşt û lastîk
Êsk û asin
Bûn be şitê
Şiteyş nawî lê nenirawe.
Lem şeqame û lem şewe da
Lem şaroçke biçûke da
Îste rijîm malosêkî ser birrawe.
Îste şimşêre kulekey destî Aşûr
Texteyekî qilîşawe (65)
Bangî kiçanewey (66) êmeyş îste
Wextêtî û hîçî nemawe.

*

---

(63) Disojît
(64) Xu hilavêt
(65) Tiştekî şeq şek kirî
(66) Paşveçûyî ( bi taybetî di şerekê da)

Beyanî bû serî seàt
Bê sîmî naw kune eşkewt
Bê sîmî naw daristan û herd û pêdeşt
Zimam û gwêy senger bûn û
Eyanbîst û dengyan ehat
Wekû nanî germî tenûr
Hewalî tazey neberdyan
Bo yek ne nard
Beyanî bû serî seàt
Bê sîmekan be zîkezîk
Be pele pel
Zemanyan kurt ekirdewe
Wekû aryel
Rêgay dûrîş be rêy nizîk
Beyanî bû serî seàt
Dinya sard sard
-Şepol .(67) Şepol. helo!
Wekû hawarî binî bîr
Deng zor kiz e
-Şepol. Şepol. Helo!
Tû dabeze.
-Helo. Helo. Şepol!
-Îste baş e
-Dey çît heye?!
-Biruskeyekî pele ye..
-Min amadem
Berdewam be

(67) Navekî kurdî ye.

-De binûse.
Îtir bruske key helo wekû gulaw le sêberewe bo
hetaw
Herçî hengî dûr û nizîkî bêsîmî naw şoriş e..
Be gîze gîz dewrî eden
Be jawe (68) jaw gêjî eken
Sere rêy xetî lê egirin
Hendê tewaw
Hendêkî tirîş natewaw
Goy hewalî taze emjin
Îtir bruske key helo le naw şeş hewt dêrî şaşa
Jûrî hewal dirust eka..
Jûrê bo ziyanî dujmin
Kujraw. Zamdar (69)
Jûrê bo dîl
Naw yan ebat..
Dergayan le ser daexat.
Jûrî deskewt- çek û fîşek
Çekî gewre bira gewren
Le pêşewe naw yan ebat..
Emcare yan le naw jûrî
Dîlekanda (70)..
Dalî gîrawî kiz û mat
-Aşûr Hemdan-
Nêçîrêkî qelewyan e
Boye bêsîm
Peyta-- peyta

هەواڵنامەی کتێب
&
KURD ARSHIV

(68) Dinge ding
(69) Birîndar
(70) Esîr

Nawî ebat.
Hewal jûr be jûr egerê
Heta diwa jûrî birûske
Jûrêkî reng erxewanî
Dergay wala û
Pencerey danexistuwe
Ew jûrey çawî şehîdî
Tazemanî
Tiya nûstuwe
-Helo. Helo. Şepol!
-Şepol. Şepol. Helo!
-Berdewam be
Kake lay minewe tewaw
Serî seàt ser berewe
Eger hewalî taze hat
Amade be.
-Erê cew lay êwe çon e?!
-Le şewêwe befir ebarê
Heta êste
Sê car serbanman malîwe..
-Ey lay êwe..
Halî êwe û pîre zistan?!
-Her baran e û belam lafaw (71)
Rêy ême û gundî birîwe..
-Îşê.. karê?!
-Her xoşîtan
-Xwa hafîz bê.
Befre û baran. Le wê befre û lêre baran lew lagire.

(71) Lehî

Lem la kize. Le naw nexşey pêşmerge da.
Serma û germa.
Terze û pişko, seryan nawe be yekewe,
werz egorin.
Sal egorin. Dinyay kon hel egîrnewe. Le naw bfra
Xwên erwênin, le naw xwêna,
terze û befir etwênnewe
Kêlgey birsêtî ekêlin. Dexlî azarî
yek be de edrûnewe
Befre û baran befrîş pêşmergey siruşt e.
Pêşmêrgey şoriş û
Siruşt lem werze da qolyan le qol da û
pêkewe rêgekanî
Dal ebestin çingekanyan (72) le go exen
balekan yan ebestinewe.
Befre û baran. Eweta wa Aşûr hemdan
dalaşî reşî bal şikaw
Buwe be faqey (73) pêşmerge û siruşkewe
derdest kira û şimşêrekey
Zelîl zelîl. Paranewey (74) damaw damaw.
Dalî gîraw
Dalî nawsik pir le bêçuwe çolekey
Kurd pêşxirawe û ret ebat û
Hengaw hengaw ejnoy eşkê îste Aşûr peyamêk e
Kesîre bû. Diruşmêke qaç û qul û dest û
pence serma birdû.
Meger her tenha bînî aw lem kate da wekû

---

(72) Penc
(73) Dav, xefik
(74) Hîvîya lêbirdinê dike

Aşûr le tirsan da
Helbilerzê.
Rê dirêj e. Wekû mêjûy pir eşkence. Rê dirêj e.
Çeqene berd. Helet helet. her şeqawêk dal erwat û
Şeqawêkî tir ekewê bo berew jûr.
Duwa piley dund,
Çawî kujawe hel ebirê. Le piştewe
lûley tifengekey
Azad egakewe ser qebirxey (75) helî ebirê,
eyxatewe, ser
Tule rê. Wekû awêney tem girtû çawî
Aşûr tarmayî
Azad ebînê. Azad eçête ber demî hel etruşkê,
Emcareyan ke pişûdan (76) be lepî
dest awêney çawî tem girtûy
Aşûr esrê, ewsa îtir nek wênekey belku Azad,
Xwênî, goştî, xoy ebînê, dengî Azad.
Qaqay pêkenînî Azad,
Xoy ebîsê emcareyan dal etaşê û tamayî merg
Destbexencer le ser serî ra ewestê paş
çend rojê dal
Rîşhatû. Pantol diraw. Wek gîskêkî ler û
lawaz egate cê

*

---

(75) Tenişt
(76) Bêhnvedan

Şewî kilpe (77) û helmeteke. Aşûr xoy kird
be nexoş û neçuwe derê.
Şimşêrî le kun xizawbû. Le kentor da pişîle
bû xoy mat dabû.
Komelê caş reng pê ne maw, henase suwar,
çûne malê wityan
Refîq were derê firyakewe, wa meqer û wêney
Sultan û şoroçke be yekewe gir esênê.
Dalî naçar hate derê
Diwa landirover rawestawe û siwarî ebê.
Des le ser dil ekewne rê
Wextê Aşûr dûzexî pêş xoy ebînê zaretirîk
ehebesê (78)
Her be pence ferman eda û şofêr berew
duwa sukanî weregêrê
Bosey yekem amade ye û dereperê û wek
nêçîrî çaw bewenewz (79)
Eyangirê.

*

Her ew şewey çingî heloy xo kizkirdû
Dalî firan..
Le dolêkî qerax şarda. Kir, nepindî
Ke mefreze tir bûnewe..
Gîrfan.. gîrfan
Cilî berî Aşûr û dîlekan geran

---

(77) Pêt
(78) Hêbet girtê
(79) Xew girtî

Yeke be yeke û ciya be ciya
Çî yan tiya bû be dest nîşan
Be jimardin deryan hênan
Le ser mêzî taşeberdê
Wekû bilêy
Bo ewan dirust kirabê..
Dayan enan.
Lew deme da baran xoşî kirdibowe
Le we eçû emcareyan bay befir bê
Her be pêwe
Le ber şewqî emlaw emlay çend laytê
Azad le şitî naw gîrfan wird ebowe
Ta ser encam..
Le ber baxelî Aşûr da
Roj jimêrêkî biçkoley Qadisiye û
Hendê kaxezyan derhêna
Heshesî (80) tîşkî rûnakî
Be ser rîz be rîzda gera
Naw be nawê serinc ziyatir
Le ser hendê dêr ewesta
Ewsa Azad le ber xowe
werte wirtêkî lê ehat
Dem û çawî girj ekird û
Serêkîşî bo baeda
Le diwayî da
Ewaney gilyan danewe
Pênasekan, roj mêrê, çend kaxezî û
Çuwar deskêş bûn

(80) Nobedarê şevê

Wêne û namey zor taybetîş
Bo gîrfanî dîlî hêşta her wir û kas (81)
Geranewe.

*

Le yaddaşte nehênî yekey ber baxelî Aşûr da
Wekû laşey ser aw kewtûy diway tawan.
Îste termî şî?rî bizir. Zamî gîraw ebînînewe.
Îste gorî werzî kujraw. Dengî xinkaw edozînewe.
Îste derkewt jêr zemînî
Roj jimêrekey aşûr.
Kam pîlanî pepke xwardûy le xoy da heşar dawe.
Îste derkewt ke qenarey nehênî
Le yadaştî ber baxelî Aşûr da
Bo çend tîşkî sewzî hîway paşeroj helxirawe.
Le yadaştî ber baxelî aşûr da.
Zole yasay otonomî em hukme
Afretêke bo kamêray telefîzwênî diro
Dawên pake û spî poşe û frîşte
Diway kamêraş herzan herzan
Efroşê abrûy (82) tikaw. Ew leşe.
Le ser da be nehênîyekey
Berbaxelî Aşûr da
Çend rojêkman
Le gîrfanî ew yaddaşte derhêna.
Be pê belênêkî zûtir ke pêy da bûm

---

(81) Gêj
(82) Namûs

Pêş hefteyek jinekey (83)
Kasêtêkî mêrdekey xoy le naw singya
şardibowe û
Boy hênabûm
Wextê gwêm girt le we eçû
Wextî mest bûn qise bikat
Le şwênêk da (N) wa elê:
Em şere bo?!
Em şere wek goştî mirdûy
Bogen kirdûy lê hatuwe
Em şere bo?!
Le ber kursî û le ber çawî
Taqe kesê ?!
Hewt sal ebê.
(N) Hawirêy em sefere dirêje ye
Dwênê (N) man her be destî
Jinekey xoy derman-xward kird
Emroş be marşî eskerî û
Korewêkî zor gewrewe
Ta qerax şar (84), termekeyman
Berew "Hille" (85)
Rewane kird!
Çend raportêkî nizîkî em law ew lay
Bûn be çiray
Taqîb (86) kerman

---

(83) Ev nûn têt xwendin
(84) Kinarê bajêr
(85) Navê bajêrekî erebî ye li xaroy Îraqê
(86) Çavdêdî

Zor demêk bû le kurekey
Westa Hesen be guman bûyn
Emro le cejnî supa da
Qeza û qeder
Zîlêk şêlay!
Emîşyan qisey nesteq e (87)
Seg her seg e
Kurd her Kurd e
"Firsan e (88) yan "muxerîb" e
Emro namem bo (Ş) î (89) amozam nûsî
(Ş) le Besrey e û esker e (90)
Bom nûsîwe: Firyakewe
Xozgeyekit ehênme dî (91)
Elêy beheştî naw xewe
Parçeyek erd.. çuwar sed metrê
Baweşt bo egrêtewe..
De hezarîş parey bexşîş
Ew hatuwe be pîrtewe
Firyakewe..
Ay bo erebê ke xêra
Bêt û le cêy male Kurdê
Le şarî gewherî reş da
Xanûy taze binyat binê!
Ax! ax!
Her emcare


---

(87) Peyvên mezin
(88) Caşên kurd in ku li gel hukumeta Îraqê kar dikin.
(89) Ş: Tipekî erebî ye, şad têt xwendin.
(90) Navê bajêrekî erebî ye li xaroy Îraqê.
(91) Bi dest êxistin

Her lem şere bibînewe
Şerte nawî befir le bîr
Em şaxane berînewe
Ax.. Ax! Her emcare.
Dwênê şewê
Çuwar muxerîb be çiwar çek û
Dûy ziyadewe
Xoyan da ye dest mexferê
Xom çûm dîmin
Etwit gemalî çilkin in
Belam seyr e
Boçî heta lay ewanin
Ko le merg nakenewe
Keçî ke dêne lay ême
Elêy tancî tirsinokin?!
Emro mandûyn
Le şebeqewe xerîkî
Ragwênarî çuwar pênc gundîn
Min û Nasir
Hewt seàt ebê be pêweyn
Zor şeketîn (92)
Heta êsteş wir û kasî
Teqînewey dînamêt în
Emro (E) û (S) man bang kird
Em dû qelebaçke Kurd e
Temenî malî kirdinyan
Îste le çuwar sal ziyakir e..
Pêman witin: Qelebaçke berêzekan

(92) Westîyay, bê taqet

Êwe ebine ziman û gwêy gelî Kurdman
Bo em dewrey dahatuwe
Ebê xotan helbijêrin
Lemroyşewe wa bizanin
Dû endamî encumenen.
Le Bexdawe emro laşey
Dû muxerîbî gîrawyan
Hênayewe bo şaroçke
Le bazar da çipe çipe
Ablûqey malekanman dan
Bawkî herdûkyanman bang kird
Pêman witin.. baş gwê bigrin
Ewey legel ême nî ye
Ger wa bimrê pirsey nîye
Derga daxen!
Giryanîştan qedexe ye.
Wek dîbûyan:
Muxerîbêkî xirîley demax kirdû
Emro seàt sêy esir bû
Le meydanî gewrey şar da
Refîq (Nasir Silîman) î
Daye ber rîzî demançe û
Yekser kuştî
Wekû muruy xeyb weha bû
Kes neyzanî bo kwêş derçû!
Dwê nîweşew
Be pêy nexşe û torêkî wird
Kes û karî nizîkey bîst muxerîbman
Wekû mirîşk û cûcele
Le xew da girt.



Emro sit "şermin" im bang kird
Şermin berpirsî yekêtî afretan e
Pêm wit: bo xoşî efsere azakanî
Em Îraq e
Le endaman wek gol bijêr
Bo ahengî Qadisîyey sûrî emşew
Çepkê kiçî rengaw rengî zor nasikman
Le guldanî yekêtî da bo binêrê!!
Dal xerrabû. Wextê efirî
Wextê hendê pele hewrî nizmî le jêr
Pêyda edî. Way ezanî hemû lûtke û
Hemû hewrê ser da exa û be çokda dê
Leber qîrey le xobayî..
Dal xerrabû asmanî gewrey ne edî
Way ezanî zeman epêçête balî
Heta kû ser.. le ser rojan kir ekewê
Heta kû ser.. bilind efirê û
Ser berew xwar nabêtewe berew dolî
Nizim û newî..

*

Ber le dayikbûnî Îsa
Renge her lem derbende da bûbê
Hewt şew.. hewt roj
Tirs çawî "Geznefun" (93) û
Suwarey Yonanî qût dabê.
Renge her lem derbende da bûbê

---

(93) Mebest Xenofonê dîroknivîsê Yewnanî ye.

Hewt şew hewt roj
Tîrî dirêjî rim asa
Ber le dayîkbûnî Îsa
Em dîw ew dîw
Zirê poşî kun kirdbê û
Wek nîşaney mêjûy ême
Le ser dilî sitemî kon helçêqîbê
Renge her lem derbende da bûbe
Lew rewez û lew dundewe
Befir kujyan heldêrabê (94)
Renge her lem derbende da bûbê
Le eşkewtêkî êre da
Lew aste da .. lem aste da (95)
Be pol dalî bal şikawyan
Bend kirdibê!
Renge her lem derbende da bûbê.

*

Îste seàt dey beyanî
Rojî heynî.. heştî heştî
Heşta û şeş e
Le jêr keprekey xomewe
Le nêwan liqî dar gwizî gwê çemewe
Her le heman derbendewe
Le serewe
Be tûle rêy ewberewe

---


(94) Dikevite xwarê
(95) Pîwan

Rêçkeyek (96) dalî gîrawî çemawey jêr
Kole xol û xişt ebînim..
Aşûrîşyan le pêsewe
Rîçkeyek dal
Tenha bazêk le piştewe
Gil (97).. ekêşin.. berd ekêşin
Dar.. ekêşin
Bo xestexaney ew helo zamdaraney
Be balî xwênawî şoriş
Şî`rêkî nwêm bo enûsin.

BERGELÛ
08.08.1986

---

(96) Rêkeka biçûk
(97 Ax û xul



Penklubba Swêdê, di sala 1987-an de Şêrko Bêkes hêjayê xelata TUCHOLSKY dît. Şêrko, di sala 1987-an di 14 ê meha tebaxê de li Swêdê xelata TUCHOLSKY wergirt. Serokwezîrê Swêdê Ingvar Carlsson bi xwe xelatê pêşkêşî Şêrko Bêkes kir. Bi xelatgirtina navnetewî, Şêrko Bêkes serê helbest û wêjeya (edebîyata) kurdî gelek bilnd kir. Û nav û dengê wêjaya kurdî gehêştan her aliyê cîhanê. Herweha helbest û wêjeya Kurdî kete pêvajokê nû û bilind.

هەواڵنامەی کتێب
&
KURD ARSHIV

örlag